Beriya ku li cihê navborî xebat dest pê bikin, ligel saziyên fermî, şaredarî û saziyên sivîl ên li ser mafên mirovan dixebitin, hevdîtin hatin lidarxistin. Nexşerêyek hate amadekirin; di vê nexşerêyê de saziyên ku xizmetên wan berdewam in û gava malbat biçinê karibin sûde jê wergirin û agahiyên derheqê van saziyan de hebûn. Evê nexşerêya ku hatî amadekirin li malbatên ku serdana wan hatî kirin, hatin belavkirin. Jê pê ve ji ber rewşa trawmatîk a muhtemel a cihê lêkolînê û serdêran, bo tîma projeyê ji aliyê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê ve perwerdeya 'Trawmaya Derûnî û Mudaxileya Psîko-sosyal' hate lidarxistin.

Beriya destpêkirina hevdîtinan, tîma projeyê xwe bi telefonê gihand malbatên ku agahiyên wan ên ragihandinê ji berê ve dihat zanîn û piştî ku destûra wan hat stendin, tîmê, serdana malan kirin û rû bi rû ligel wan hevdîtin pêk anî, formên anketê yên ji berê ve hatibûn amadekirin bi wan dan dagirtin. Kesên ku ligel wan hevdîtin hatin pêkanîn li gorî cudahiyên weke temen û zayend nehatin hilbijartin, heçî kesên ji aliyê malbatan ve li gorî şert û mercên xwe hatî diyarkirin, beşdarî hevdîtinan bûn. Di vê çarçoveyê de tîma projeyê xwe gihand 655 malbatên ku hatine dercîkirin, 82 malbatan di serî de li ser telefonê hevdîtinê red kirin, 73 malbatan jî ligel ku li ser telefonê hevdîtinê qebûl kirin, li malê nexwestin hevdîtin pêk bînin. Ji 500 malbatên ku hevdîtinê qebûl kirin 489ên wan bersiv dan hemû pirsan, lê 11 malbatan, ji ber sedemên cihê qismen bersiv dan pirsan. %40ê malbatên ku ligel wan hevdîtin hatin lidarxistin li taxên ne qedexekirî yên Sûrê, %26ê wan li Yenîşehîra ku hema li ber serê Sûrê ye(bêhtir li taxa Şehîtlîkê), %30ê wan li Baglarê, %4ê wan jî li Kayapinarê(bêhtir li taxa Hûzûrevlerî) rûdinin.

Li gorî lêkolînên me yên beriya xebatê yên bo projeyê; ji 6000î zêdetir malbat û herî kêm 24000 kes ji ber tesîra pevçûnên li navçeya Sûrê û ragihandinên qedexeya derketina derve, hatine dercîkirin.1 Lê him ji ber zehmetiya bidestxistina adresên nûyên hemû malbatan, him jî ji ber wextê kurt ê projeyê, projeya me 500 malbatan dihundirîne. Ji ber van, divê bê zanîn ku daneyên lêkolînê, çavdêrî û encam li gorî van çavkaniyên sînorkirî ne. Di nav hemû malbatan de 500 nimûne hin kêmaniyan dihundirîne, lê ev jî rastiyek e ku evan malbatên nimûne ji ber heman sedeman ji Sûrê qetiyane, li heman taxan mane û bi piranî xwedî heman taybetmendiyên sosyo-ekonomîk in û ji ber van jî vê xebata derheqê wan de daneyên girîng pêşkêş dike.

1) Yerinden Edilen ve Mülksüzleştirilenler: Sur Sakinlerinin Evlerine Dönme Hakkı, Af Örgütü, Aralık, 2016. Link: http://www.raporlar.org/AfOrgutuSurRaporu/ Erişim: 5 Şubat 2018.

QADA LÊKOLÎNÊ-SÛR

Paşxane: Binyada Demografîk a Sûrê û Pêvajoya Dercîkirinê

Paşxane: Binyada Demografîk a Sûrê û Pêvajoya Dercîkirinê Ameda, heya çaryeka ewil a salên 1900î ji herêma li nava sûrên ku navê xwe daye navçeya Sûrê pêk dihat. Tê texmînkirin ku di nîveka sedsala 19. de nifûsa bajêr bi qasî 35-40 hezar hebûye û nîvê vê nifûsê ji Ermenan, Suryanan, Keldaniyan, Rûman, Cihûyan; nîvê dî jî ji Kurdan, Tirkan û Ereban pêk hatiye.[2] Ji xeynî van koman bi hejmareke hindik Çerkes, Elewî û Êzidî li gundên nêzî bajêr dêmanî bûne.

Sûrên ku bajarê berê dorpêç kirine û wexta meriv ji jor ve lê mêze dike weke masîpankê xuya dike, bi qasî 5.7 km ye û li seranserî sûrê 82 birc hene.[3] Bexçeyên Hewselê û sûrên vê navçeya ku tarîxa qedîm a Amedê di nava xwe de hewandiye, ji 2015an vir ve xwedî statuya Mîrateya Dinyayê ya UNESCOyê ne.[4]

Hemû avaniyên sembola dewlemendiya çandî yên weke Mizgefta Mezin, Minareya Çarling, Dêra Ermenan a Sûrp Gîragos, Dêra Katolîkên Keldanî ya Mar Petyûn, Dêra Suryaniyan a Dayîka Meryem li nava Sûrê ne.

Sûra ku bîra hezaran salan a çeşîddariya çandî di xwe de dihewîne, di heman demê de yek ji şahidên kêşeya kurd e. Ji ber pevçûnên piştî salên 1980yî, nemaze jî piştî salên 1990î gelek gundên hatin valakirin û evê nifûsa zêde neçar ma ku koç bike. Evê nifûsê li navçeya Sûre û li derdora vê navçeyê bicî bûne û bi vî awayî nifûsa bajêr di demeke kurt de bûye du qat. Li gorî daneyên sala 2015an ên Saziya Statîstîkan a Tirkiyeyê(TUÎK) nifûsa navçeya Sûrê 58.079 jê mêr û 59.619 jê jin, tevde 117.698 kes e. Ji cergî ku koça zêde qewimiye vê navçeyê bo koçberan bûye cihê vehewînê û her weke yek ji navçeyên herî xizan maye.[5]

Şêniyên Sûrê mexdûrên in ji ber pevçûnên 40 salan ên ji ber kêşeya kurd. Her çiqas bêhna evan şêniyan bi saya Pêvajoya Çareseriyê piçekî derketibû jî, pevçûnên ku piştre dest pê kirin bûn sedemên pirsgirêkên mezin. Çimkî evan pevçûnan li nava bajaran, nemaze jî li nava Sûrê qewimîn.

Pêjavo bi ragihandina "xwerêvebirin"ê dest pê kir. Piştre di serî de li Sûr, Cizîr, Silîva û pê re li navendên bajarên din xendek hatin kolan, barîkat hatin avakirin û di operasyonan de pevçûn pêk hatin. Qedexeyên derketina derve ku li Amedê cara ewil di 6ê îlona 2015an de hate ragihandin û operasyonên leşkerî û pevçûnên çekdarî yên bi vana ve girêdayî heya roja 28ê mijdarê ku ewê rojê Tahir Elçiyê Serokê Baroya Amedê hate kuştin, "bi gurahiyeke kêm" û binavber dewam kir. Di nava vê demê de ligel qedexekirina derketina derve bo gele Sûrê yê ku li cihê pevçûnan asê mabû, av û ceyran hatin birîn, şebekeyên telefonan hatin astengkirin, malbat wexteke dûdirêj li malên xwe asê man û gihaniya mafên esas ên weke xurek û tenduristiyê her ku çû bû tişteke nepêkan.

2) Eski Diyarbakır'da Kültürel Çeşitlilik, Agos, 2012. http://www.agos.com.tr/tr/yazi/806/eski-diyarbakir-da-kulturel-cesitlilik-fotograf-sergisi-11-mart-ta-sona-eriyor
3) Şeyhmus Diken, Surlar ve Sırlar, Bianet, 2004. https://bianet.org/bianet/toplum/33729-surlar-ve-sirlar
4) UNESCO, Diyarbakır Surları ve Hevsel Bahçeleri Kültürel Peyzaj Alanı, 2015. http://whc.unesco.org/en/list/1488
5) Türkiye İstatistik Enstitüsü, Gelir ve Yaşam Koşulları Araştırması Bölgesel Sonuçları, 2015, http://www.turkstat.gov.tr/PreHaberBultenleri.do?id=21868

Komîsyona Venedîkê, di rûniştina xwe ya hezîrana sala 2016an de nêrîna xwe ya derbarê qedexeya derketina derve de weke "Biryarên qedexeyên derketina derve yên hikûmeta Tirkiyeyê li Makeqanûna Komara Tirkiyeyê û li şertê hiqûqî yê Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê nayê" ragihand û tewsiye kir ku qedexeyên derketina derve ku di çarçoveya Qanûna Îdareya Bajaran de tê birêvebirin, bête bidawîkirin, tevdîrên lezgîn li gorî qanûnên neteweyî yên Tirkiyeyê û berpirsiyariyên navneteweyî bin û li ser çarçoveya qanûnî ya ku destûr dide biryarên weke qedexeya derketina derve bifikire.[6]

Li gorî texmînên Koma Krîzê ya Navneteweyî(mijdara 2016an) ji ber pevçûnên çekdarî yên li herêmê 368 jê bê çek, herî kêm 2360 kesên ji xelkê herêmê mirin.[7] Li gorî daneyên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê(TÎHV), li deverên ku di navbera Tebaxa 2015an û Tebaxa 2016an de qedexeya derketina derve hatî ragihandin, 79 jê zarok, 321 kesên bê çek mirin. Li gorî daneyên TÎHVê sê jê zarok 10 kesên bê çek li Sûrê mirin.[8]

Li gorî agahiyên ku Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî(Amnesty International) di gulana 2016an de ji Walîtiya Amedê û Serekdozgeriya Komarê wergirtine, di 9ê Adara 2016an de operasyon û pevçûnên çekdarî bidawî bûn, di encama vana de 65 leşker û polîs û 65 kesên çekdar ên bi PKKê re têkildar hatine kuştin û cenazeyên wan eşkere ne, weke din 68 kes jî hatine binçavkirin.[9]

Di meha îlonê de pevçûnan dest pê kirin, ji ber van pêleke koçberiyê dest pê kir û ev yek ku çû zêde bû. Ji roja 28ê mijdarê heya 11ê kanûnê bo 9 rojan qedexeya derketina derve hate ragihandin. Piştî wê di 11ê kanûna 2015an de li 6 taxên Sûrê qedexeya derketina derve hate ragihandin ku 24000 kes di bin tesîra wê de man[10] û ji 11ê kanûna 2015an heya 9ê adara 2016an bênavber, tevde 90 roj da ber xwe. Lê ligel ku bidawîbûna pevçûnên 90 rojan hat ragihandin jî li herêma pevçûnan a li Sûrê qedexeya derketina derve hêj berdewam e.

Tê texmînkirin ku ji ber xendekên hatî kolandin, barîkatên hatî avakirin, operasyonên hatî meşandin û pevçûnên rû dane, bi qasî 6 hezar malbat hatine dercîkirin. Dîsa tê texmînkirin ku hejmara kesên ku rasterast di bin tesîra van de mayî digihê 40000î. Lê piştî pevçûnên ku li taxên tarîxî yên bajêr qewimîn, navçeya Sûrê di 25ê adara 2016an de ji aliyê Lijneya Wezîran ve di çarçoveya "qanûna afetê" de weke qada xeternak hate ragihandin û qada ku bi qasî 6642 parsêl e û tevde li 50 hezar kesî tesîr kiriye, bi xwespartina xala 27. a Qanûna Îstîmlaqkirinê ya bi tarîx 1983 û bi hejmar 2942, bi "biryara îstîmlaqkirina acîl" hate îstîmlaqkirin.[11] Bi vê biryara îstîmlaqkirinê saziyên fermî yên navborî, ji bo ku ji malên xwe derkevin teblîxat dan hemû şêniyên taxên weke Ali Paşa û Lale Beyê ku rasterast di bin tesîra pevçûnan de nemane û nifûsa wan bi ser 5 hezarî ve ye û piraniya xaniyên ku li van taxan in, hatin valakirin.

6) Türkiye'deki Sokağa Çıkma Yasaklarını Düzenleyen Yasal Çerçeveye Dair Görüş, Venedik Komisyonu'nun 107. Genel Oturumunda kabul edilmiştir (Venedik, 10-11 Haziran 2016), http://www.venice.coe.int/webforms/documents/?pdf=CDL-AD(2016)010-e

7) Uluslararası Kriz Grubu'nun 18 Kasım 2016 tarihli verileri. Grubun 16 Mart 2018 tarihli güncel verilerine göre yaşamını yitirenlerin sayısı için bkz. http://www.crisisgroup.be/interactives/turkey/

8) Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 16 Ağustos 2015-16 Ağustos 2016 Tarihleri Arasında Sokağa Çıkma Yasakları ve Yaşamını Yitiren Siviller Bilgi Notu, 21 Ağustos 2016, http://tihv.org.tr/16-agustos-2015-16-agustos-2016-tarihleri-arasinda-sokaga-cikma-yasaklari-ve-yasamini- yitiren-siviller-bilgi-notu/

9) Af Örgütü'nün Diyarbakır Valisi ile gerçekleştirdiği görüşme, 20 Mayıs 2016. http://www.raporlar.org/AfOrgutuSurRaporu/

10) Diyarbakır Valiliği'nin sokağa çıkma yasağına ilişkin basın duyurusu, http://www.diyarbakir.gov.tr/11122015-basin-duyurusu-surda-sokaga- cikma-yasagi?_sm_au_=iVVlNVl4mjjFFJV2

11) Sivil Sayfalar, Sur'un Tarihini Silen Düzenleme, 2017. http://www.sivilsayfalar.org/2017/05/04/surun-tarihini-silen-duzenleme/

ENCAMÊN LÊKOLÎNÊ


1. MALBATÊN KU LIGEL WAN HEVDÎTIN PÊK HATIN

1.1. Demografî

I. Daneyên Zayendê


Ji nav 500 nûnerên malbatan ên ku ligel wan rû bi rû hevdîtin pêk hatine, 415 jê jin, 85 jê mêr in. Hêvî ne ew bû ku di hevdîtinan de wekheviyeke zayendî hebe lê dîsa jî ferqeke bi vî rengî nedihate raberkirin.

Ew kesên ku li ser telefonê pê re têkilî hatiye danîn mêr bin jî di serdanên malan de kesên ku beşdarî hevdîtinan bûne, bi piranî jin bûne. Ev rewşa hatî gotin ji ber vê yekê ye. Di serdanên malan de mêrên malan li mal bin jî beşdarî hevdîtinan nebûne û xwestine ku jin pirsan bibersivînin. Ji ber ku armanca sereke ya xebata me tespîtkirina rewşa giştî ya malbatan bûye evê ferqê tesîreke neyînî li xebatê nekiriye.



II. Daneyên Temenî


Ji 500 kesan bi tenê kesek bersiv nedaye pirsa derheqê temen de, temenê %6ê 414 jinên ku bersiv dane di navbera 18-24an de, temenê %16ên van di navbera 25-31an de, temenê %22yên van di navbera 32-38an de, temenê %18ên van di navbera 39-45an de, temenê %38ên van bi ser 46an ve bûye. Hatiye dîtin ku weke jinan, piraniya 85 mêran ji navsere û ji navseretiyê bi wê de bûne.



	18-24	25-31	32-38	39-45	Bi ser 46'an ve
Jin	25	67	89	76	157
Mêr	3	5	16	23	38

III. Rewşa Zewacê


499 kesan bersiv dane vê pirsê, hatiye tespîtkirin ku %83yê van mehra fermî birîne, %4ê van mehra mele birîne, %3yê van azib, %2ê van ji hev qetiyayî ne, hevserên %8ê van wefat kirine.



IV. Rewşa Perwerdeyê

Ji 500 kesan 499an jê bersiv dane vê pirsê û hatiye tespîtkirin ku ji nav 414 jinên ku bersiv dane %62ê wan nexwendî ne, %15ê wan xwendî ne, %17ê wan ji dibistana seretayî mezûn in, %4ê wan ji dibistana navîn mezûn in, %2ê wan ji lîseyê mezûn in û yeka ji wan mezûna lîsansê ye. Hatiye dîtin ku ji nav 85 mêran %35ê van nexwendî ne, %10ê van xwendî ne, %35ê van ji dibistana seretayî mezûn in, %15ê van ji dibistana navîn mezûn in, %3yê van ji lîseyê mezûn in, %2ê van mezûnên pêş-lîsansê ne.


Ji ber ku piraniya serdêran jin bûne(414 kes) hejmara jinên nexwendî zêde derketiye. Lê heke meriv bala xwe bide hejmara mêran(85) meriv dê bibîne ku rêjeya mêrên nexwendî jî zêde ye. Gava meriv bi giştî li tabloyê binêre meriv dibîne ku ji nav serdêran %58 jê nexwendî ne. Di nava navçeyên navendî de navçeya Sûrê ji berê ve ji aliyê perwerdeyê ve yek ji navçeyên xwedî dezavantaja herî zêde ye. Ji nav nûnerên 500 malbatên ku bi rasthatinî hatine hilbijartin kesek mezûna lîsansê ye, mêr an jin 11 kes ji lîseyê mezûn in, dîsa ji van 500 kesan 300 jê nexwendî ne. Vana derheqê rewşa perwerdeyê ya şêniyên Sûrê de fikrek dide meriv.



	Nexwendî	Dibistana Seretayî	Xwendî	Dibistana Navîn	Lîse	Pêş-Lîsans	Lîsans
Jin	257	61	69	17	9	0	1
Mêr	30	8	30	13	2	2	0

V. Rewşa Malbatan


Li navçeya Sûrê xaniyên musteqîl ên bihewş hene û li vir jiyana li taxan berdewama berê ye. Ji ber vê yekê li gorî herêmên din ên bajêr ên xwedî plansaziya bi apartmanan, li vê derê, xaniyên ku malbatên mezin karibin lê bihewin zêdetir in. Her çiqas di salên dawîn de li nava Sûrê jî awayê avakirina xaniyan guherîbe û hejmara malbatên mezin kêm bûbe jî cureyên van malbatan li Sûrê hêj berdewam in. Malbatên ku di çarçoveya lêkolînê de serdana wan hatiye kirin; di rêjeya %79an de malbatên biçûk û di rêjeya %20an de malbatên mezin in.



	Malbata Biçûk	Malbata Mezin	Yên xwedî Hevserek Zêdetir	Bi Tena Serê Xwe
Rewşa Malbatan	296	102	0	2

1.2. Rewşa Sosyo-ekonomîk

I. Rewşa Ewlayiya Civakî




	Bag-Kur	SGK	Sindoqa Malnişîniyê	Yeşil Kart	Bêyi Ewlayiya Civakî
EWLÎYAYA CÎVAKÎ	24	110	34	314	17

Ji 500 nûnerên malbatan 499an jê bersiva vê pirsê dane, hatiye dîtin ku ji malbatên ku bersiv dane %63 xwedî karta kesk û yê 17 malbatan li ser ti sîstemê qeydên wan nîn in. Ji xeynî vana rêjeya malbatên ku li ser sîstemê bi awayekî qeydên wan hene derdora %33 ne.

Nîşe: Bag-Kur(4B-Sîgorta), SGK(Kesên ku bisîgorta dixebitin), Sindoqa Malnişîniyê, Yeşil Kart(Kesên ku di çarçoveya zagona Sîgortaya Tenduristiyê ya Gîştî de prîmên wan ji aliyê dewletê ve têne razandin), Bêyî Ewlayiya Civakî(Kesên ku ji ber deynê prîma Sîgortaya Tenduristiyê ya Gîştî jê sûde wernagirin)

II. Rewşa Xebatê


Ji 500 nûnerên malbatan, ku rû bi rû ligel wan hevdîtin pêk hatine, 499an jê bersiv dane vê pirse. Li gorî bersivan rêjeya serdêrên ku dixebitin %9 jî nine. Gava meriv 13 kesên teqawîtbûyî jî li vê hejmarê zêde bike rêje digihê %11an. %89ê nûnerên malabatan ti karî nakin. Ev rêje bo jinan di ser %96an re, bo mêran derdora %52an e. Evê rêjeya bêkariyê ya derbarê merênSûrê de yek ji faktorên xizaniyê ye. Ligel vê xuya ye ku jinên li Sûrê hema hema qet naxebitin. Divê neyê jibîrkirin ku serdêr bi awayeke rasthatinî hatine hilbijartin. Ji ber vana bêkariya jinan encameke balkêş e û divê li ser bê rawestandin.



	Xebarkar	Ne Xebarkar	Malnişîn
Jin	10	399	5
Mêr	33	44	8

3. Kar û Bar


Ji 500 kesan 499 jê bersiva vê pirsê dan û %10ê wan jî ne karker, malnişîn û esnaf in. Ji xeynî van, 10 kes weke firoşerên seyar, karkerên wehdetiyê û xebatkarên rojanî dixebitin ku ev kar ne karên berdewamî ne. Di nav yên mayî de jin bi piranî bi awayê ku em weke "karkerên malan ên bêheq" pênase dikin, karen malan dikin û nayên îstihdamkirin. Diyardeyeke balkêş e ku ji van 500 nûnerên malbatan, ku ji navçeya Sûrê bi awayeke rasthatinî hatin hilbijartin, yek jê jî ne karmend e.



Bêkar	Karker	Malnişîn	Karmend	Esnaf	Karkeren Malan Ên Bêhaq	Yêd Din
44	27	13	0	6	399	10

IV. Hejmara Kesên Xebatkar Di Nav Malê De


Di serdana 500 malbatan de ji ewan kesan hatiye pirsîn bê ka hejmara şêniyên malê çend in, lê temamê malbatan nexwestine bersiv bidin vê pirsê. Li gorî daneyên ku ji hevdîtinan hatî bidestxistin nifûsa van 500 malbatan tevde derdora 3000î ye. Wekî ku ji grafîkan jî diyar e barê debarê yê nîvê van malan bi tenê di stûyê keseke xebatkar de ye. Bi texmînkî serê malê 6 nifûs dikeve û meriv evê hejmarê û asta dahatên wan bide ber hev meriv dê bibîne ku piraniya malbatan di nav şertên xizaniyê de dijîn. Wekî din, di nav nîvên malbatan de keseke xebatkar nîne û ev encameke balkêş e.



Hejmara Kesên Xebatkar	Hejmara Malan
Kesek	245
2 Kesek	13
3 Kes	3

V. Rewşa Ewlayiya Civakî ya Xebatkaran


Li gorî encamên hevdîtinên ligel nûnerên malbatan, tevde 280 kes dixebitin. Agahiyên derheqê ewlayiya civakî ya 280 kesan de, li ser grafîka li jor hatiye nişandan. Tê fêmkirin ku %44ên xebatkaran di çarçoveya SGK û Bag-Kurê de xwedî ewlayiyek in, lê piraniyeke weke %56ên wan bêyî ku xwedî ti ewlayiyeke civakî bin, dixebitin. Dema em bidin ber çavan ku di piraniya malbatan de bi tenê kesek dixebite, em ê bibînin ku îstihdama nefermî gelek insanan ji ewlayiya civakî mehrûm hiştiye.



	SGK	Bag-Kur	Bêyî Ewlayiya Civakî
Ewlayiya Civakî ya Xebatkaran	119	3	158

VI. Dabeşiya Cinsî û Temenî ya Xebatkaran


Di 500 malan de derdora 3000 kes dijîn, ji van 280 kes dixebitin û ji van 276 kesan bersiv dane vê pirse. Tê dîtin ku piraniya van 276 kesan mêr in û bi temen bi ser 25an ve ne, di nava van kesan de rêjeya jinan %10 e û ev jinên xebatkar bi temen di navbera 18-31an de ne.



	Ji Biniya 18an ve	18-24	25-31	32-38	39-45	Bi Ser 46an ve
Jin	2	10	6	5	2	3
Mêr	9	26	49	59	51	54


VII. Dahata Mehane ya Malan

Ji 500 malbatan 62 jê xwedî dahateke birêkûpêk nîn in û bi tenê %20ê malbatan zêdetirî 2000 TL dahat bidest dixin. Li gorî gotinên wan hema hema nîvê malbatan xwedî dahateke di navbera 1000-2000 TL de ne. Tê texmînkirin ku zêdehiya vê hejmarê ji ber alikariya kirê ya walîtî/qeymeqamtiyê ye. Li gorî gotinên ewan kesên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine, malbat, desteka kirê ne tenê ji bo kirêya xanî, lê ji bo debara malê jî bikar tînin.




	1-1000 TL	1001-2000 TL	2001-3000 TL	Zêditirî 3000 TL	Ne Xwedi Dahateke Birêkûpêk
Dahata Mehane ya Malan	121	215	97	3	62


2. MALBAT LI SÛRÊ ÇIQAS WEXT MANE Û ÇIMA HATINE WÊ DERÊ?



Karmendî	Derfeta Kar	Tenduristî	Zewac	Perwerde	Şewitandina/Valakirine Gundan	Yên Din
0	28	2	81	0	37	2



Ji Navçeyeke Din	Ji Gund	Ji Bajareke Din	Li Sûrê hatiye dinyayê û li wir mezin bûye	Yên Din
80	33	36	348	1



1-5 Sal	6-11 Sal	12-17 Sal	18-23 Sal	Bi ser 24an ve
17	16	20	29	416

Li gorî daneyên ku ji hevdîtinan hatî bidestxistin, 498 nûnerên malbatan bersiva vê pirsê dane, %22ê van ji gund û navçeyên Amedê hatine û 36 malbat ji bajarine dî hatine.

Li gorî beyanên 150 nûnerên malbatan ên ku ji gund û navçeyên nêzî Sûrê an jî ji bajarine dî hatine, %19 jê bo îmkanên kar û xebatê li navenda bajêr, %54(ku hema hema temamê vê jin in) jê ji ber zewacê, %25 jê ji ber valakirina gundan hatine û li Sûrê bicî bûne. Sûr, ji destpêka salên 90î ve bo malbatên ku bi zorê ji gundên xwe hatine derxistin, bûye yek ji mekanên koçkirinê. Ji 4 malbatên ku ji derve hatine sê ji wan ji ber koçberiyê mexdûr bûne. Ev balkêş e. Ligel vê van malbatan koçberiyeke bi darê zorê ku di salên 90î de dîtine di 2015 û 2016an de dîsa dîtin. Vê yekê trawmayên wan ên berê jî azirandiye û trawmayên wan ên îroyîn xedartir kiriye.

%70yê serdêran li Sûrê hatine dinyayê û li wir mezin bûne. %84ê wan zêdetirî 24 salan in li Sûrê nîştecih in. Ewqas insan wexteke ewqas zêde li Sûrê dijîn. Vê yekê ji aliyê domandina têkiliyên mehelî yên kevneşopî ve û ji aliyê sosyo-ekonomîk ve girîng e. Divê neyê jibîrkirin ku piraniya nîştecihên Sûrê ev e bi qasî temenê du nifşan in li nava Sûrê dijîn, daneheviya xwe ya sosyo-ekonomîk û sosyo-çandî li van deran bidest xistine. Evan insanan ji ber pevçûnek û ji nişkê ve ji Sûrê derketin. Bi van hemûyan ve girêdayî, divê tesîra trawmatîk a li ser van insanan neyê jibîrkirin.

3. MERCÊN DERCÎKIRINÊ û PIŞTÎ WÊ

3.1. Vehewîn

Malbatên ku ji ber pevçûn û operasyonan ji neçarî ji jiyanên xwe yên dêmanî yên li Sûrê qetiyan, an ji ber hêviya ku dê zû li malên xwe vegerin an jî ji ber pevçûnên dijwar ji mecbûrî lezandine û pêdiviyên xwe yên weke alavên malê bi xwe re dernexistine, piraniya wan bi cilên xwe û alavên sivik koç kirine. Piştî vê koça ji neçariyê, ne tenê tesîrên ekonomîk, tesîrên sosyal, çandî û bi vê ve girêdayî yên derûnî rû dane û ev hêj berdewam in.

Hemû malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatin, bilêv kirine ku beriya pevçûnên li Sûrê him ji alî ekonomîk ve, him jî ji alî civakî ve jiyan bo wan hêsantir bûye, di pêvajoya dercîkirinê ya ji ber pevçûn û operasyonan de û piştî wê standardên jiyana wan gelekî xirab bûne. Li gorî bilêvkirina hin malbatan di destpêka pêjavoya dercîkirinê de, mecbur mane ku wextekî li parkan, hinek ji wan li otelan, hinek ji wan jî bo wexteke kurt li cem xizmên xwe yên ku li derveyî Sûrê nîştecih in, bi-hewin. Hatiye bilêvkirin ku bi taybetî 2-3 malbatên ku xizmên hev in bi hev re xanî kirê kirine(fikra wan ew bûye ku dê li Sûrê qedexe pir neajo û ew ê li malên xwe vegerin) û bi hev re hewiyane. Lê ji ber ku wextê qedexeyê dirêj bûye, xaniyên wan xera bûne û xaniyên hatî kirêkirin ne li gorî malbatên mezin bûne, bi demê re ji hev qetiyane û her malbatek xaniyeke cihê kirê kiriye. Kesên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine, diyar kirine ku bo malbatên ku li Sûrê xwedî xaniyên bihewşên fireh bûne, bûye sedema dabeşbûna ekonomiyê.

Ji gotinên malbatên ku ji ber pevçûnên li Sûrê mexdûr bûne, tê fêmkirin ku piştî ku ji xaniyên xwe bi zorê hatine derxistin serê ewil him saziyên sivîl, him şaredariyan destek dane wan, lê evan des-tekan ne bêrêkûpêk û bi têra xwe bûne. Malbatan ji xeynî hevgirtin û destekê, qala neyînî û asten-giyan jî kirine. Malbatan bi piranî ji ber zêdebûna kirêya xaniyan, zêdebûna mesrefên barkirina ala-van û ji ber hîsa xwe ya "xerîbiyê" ya li mekanên xwe yên nû gilî û gazincan kirine. Wekî din, koça mecbûrî ya ji nava Sûrê bo derveyî Sûrê, têgeheke weke "Sûriyeyîbûn"ê derxistiye holê, her çûye bêhtir hatiye bihîstin ku "gel, çawa nêzîkî xelkê Sûriyeyê bûye bi heman awayî nêzîkî xelkê Sûrê bûye" û xelkê Sûrê her çûye xwe "weke Sûriyeyiyan" hîs kiriye. Di dema birêvebirina xebatê de ev têgeh pir nehatibe bikar anîn jî, vegotina serdêran bîra piştî pevçûnan nû kiriye. Ev jî nîşan dide ku ne tenê bi bibîrhatina pirsgirêkên îroyîn, bi bibîrhatina pirsgirêkên vê pêvajoyê bersiv hatine dayîn.


Wekî mînak; malbatên ku li Sûrê di daîreyên apartmanan de kirêgir bûne, bilêv kirine ku li derveyî Sûrê kirêgiriya daîreyên apartmanan zortir e. Gotine ku dema kirêya xaniyan li Sûrê dereng ketiye xwediyên xaniyan bêhtir famdar bûne, lê di rewşa heyî de gava kirê piçek dereng ketiye xwediyên xaniyan ew hişyar kirine, heke kirê nehatibe dayîn rewş kariye bibe sedema koçeke dîtir. Di heman demê de malbatan bilêv kirine ku çi li xaniyên bihewş çi li daîreyên apartmanan, jiyana li Sûrê ji aliyê têkiliyên cîrantiyê û çanda mehelî ve baştir bûye, li derveyî Sûrê bi kêmasiya vê yekê xwe bi tenê hîs kirine.

Di hevdîtinan de, piraniya malbatan gotine ku 1000 TLyê ku ji aliyê Weqfa Alîkarî û Hevgirtina Ci-vakî(SYDV) ve bo malbatên hatî dercîkirin tê dayîn, distînin. Ne ku malbat bi vê alîkariyê bi tenê kirêya xaniyên xwe didin, hem bo mesrefa xwendina zarokan, hem jî bo hin pêdiviyên sereke ku malbat pê jiyana xwe bidomîne, bikar tînin. Piştî pevçûnan, malbatên ku li Sûrê xwedî kar bûne bê

kar mane, di rewşa heyî de nekarîne karek peyde bikin. Ji ber vana malbatan alîkariya kirê weke dahateke mehane bikar anîne. Malbatan diyar kirine ku yên Saziya Lêgerîna Kar û Karkeran(ÎŞKÛRê) jî tê de gava kareke bisîgorta peyde kirine, gava qeyda îkametên xwe birine derveyî Sûrê, gava heqê xaniyên xwe yên xerabûyî stendine, gava kesek ji malbatê di çarçoveya desteka civakî û ekonomîk de yan jî di çarçoveya xizmetên astengdarî û xwedîkirinê de alîkariyeke nakdî stendiye alîkariya kirê hatiye birîn. Weke dî, bilêv kirine ku malên xwe ji neçarî berdane û reviyane, ji ber wê divê alîkariya kirê bi şert û mercan ve neye girêdan.

Hin malbatan diyar kirine ku piştî pevçûnan bi komîsyona tespîtkirina xisarê re çûne cem xaniyên xwe yên li herêma qedexekirî, wê çaxê dîtine ku xaniyên wan xera nebûne, lê piştî rakirina kavilên xaniyan, xaniyên wan jî xera bûne. Diyar kirine ku xerakirina xaniyên ku di pevçûnan de xisareke zêde dîtine tê fêmkirin, lê ti maneya xerakirina xaniyên ku piştî temîrateke hindik meriv karibe lê bihewe, nîne û bi vê yekê hîsa wan ew bûye ku ji bo astengkirina vegera wan a li Sûrê van kiryaran bi qestî têne birêvebirin; ji ber ku di rewşa heyî de derheqê aqûbeta xaniyên wan ên xerabûyî de ji aliyê rayedaran ve ti agahî nayê dayîn evê hîsa wan xurttir dibe.

Di nav serdêran de 489 kesan bersiva vê pirse dane, hatiye fêmkirin ku 279ên ji van xwedî xanî bûne, 210ên ji van jî ne xwedî xanî bûne. Lê piştî pevçûnan hejmara malbatên ku li xaniyên xwe rû-



	Beriya Pevçûnan	Piştî Pevçûnan
Xweyîtiya Xanî	279	74

dinin daketiye 74an. Rewşa pevçûnê ji 4 malbatên ku me ligel wan hevdîtin pêk anîne 3ê jê bêxanî hiştiye. Pêkan e ku meriv sedemên paşxaneya vê rêjeyê bi vî awayî rave bike: gava meriv li rewşa tezmînê ya xaniyên xerabûyî yên li taxên Fatih Paşa, Dabanoglu, Savaş, Cemal Yilmaz û Hasirli ku li herêma qedexekirî û pevçûnan bû, dinêre meriv dibine ku li gorî ferqa senet û tapûyê kar û barên tezmînatê hatine birêvebirin. Hatiye hînkirin ku bo xwedî xaniyên bi senet derheqê xaniyên wan de ti agahî nehatiye dayîn, ên malbatên xwedî tapu jî sê şert dane wan. Li gorî ku malbatan diyar kirine ev şert tezmînata madî, xaniyek li Îdareya Xaniyên Komî(TOKÎ) yan jî ji dêvla xaniyên wan ên li Sûrê dîsa xaniyek bûne. Lê malbatan gotine ku derheqê van sê şertan de paşê agahiyeke durist bidest nexistine, rewş hêj nediyar e. Di teklîfa ewil de tezmînata madî, li gorî nirxê rastîn gelekî kêm e. Di teklîfa duyem de tezmînata madî weke pêşînat tê qebûlkirin û xaniyek ji TOKÎ bo malbatan tê veqetandin lê divê malbat ser wê temam bikin. Vê yekê dê malbatan bixe bin deyneke giran. Di teklîfa sêyem de jî şûna xaniyên wan ên xerabûyî de li Sûrê bo wan xaniyek tê veqetandin, lê di vir de jî malbat nizanin bê xaniyên ku dê li Sûrê bêne avakirin kengî bêne temamkirin, çawa bêne avakirin û dê fîyetên wan çi bin. Malbatan bilêv kirine ku dê fiyetên van xaniyan ji yên TOKÎyê zêdetir bin, ji ber wê jî dê qet nikaribin ji bin wî barî derkevin. Piraniya malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine, xwestine ku xaniyên wan bi fiyeteke guncan ji nû ve bêne avakirin û li Sûrê bijîn. Lê hema hema hemû malbat li ser ewê boçûnê bûne ku ev her sê teklîf jî vegera wan a li Sûrê zortir dike, dewlet naxwaze li Sûrê vegerin. Ji ber ku evê rewşê hê jî ne zelal e piraniya malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatin, ligel ku beriya pevçûnan li xaniyan xwe bûne, aniha li xaniyên xwe rûnanin. Weke dî, hin malbatan diyar kirine ku li herêma xerabûyî kargehên wan hebûne, ji ber ku qeydên wan ên fermî(lewhaya bacê, ruhsata kargehê) tunebûne nekarîne ti tezmînat bo wan bistînin.

3.2. Gihaniya Xizmetên Perwerdeyê


Malbatan diyar kirine ku di pêvajoya dercîkirinê de zarokên wan nekarîne biçin dibistanên xwe û vêya yek ji neyîniyên herî sereke bûye û di terka malên xwe de mijara gihaniya xizmetên perwerdeyê hêmaneke girîng bûye. Him ji ber pevçûnan dibistan girtî bûne, him jî li cihên ku piştî koçê malbatan xwe lê girtine derheqê îkametgahê de pirsgirêk derketine. Hatiye bilêvkirin ku vana bûne asteng ku zarok neçin dibistanê, zarokên ku qeydên wan li dibistanine dî hatine çêkirin jî adapte nebûne, hin zarok ji ber tirsa ji qedexeya derketina derve nexwestine biçin dibistanê. Ji xeynî vê, li gorî agahiyên ku ji malbatan hatine wergirtin; dibistanên ku paşê qeydên zarokan qebûl kirine dûr bûne û vê yeke bûye bareke din li ser pişta malbatên ku di pêvajoya hevdîtinan de zor û zehmetî dîtine. Vêya jî bûye sedem ku zarok bi berdewamî neçin dibistanên xwe, heya piştre hin zarok bi temamî dev ji dibistanê berdin. Dîsa hatiye îfadekirin ku di heman serdemê de dersen zarokên ku bi berdewamî diçin dibistanên xwe xirab bûne û zarok bêyî dilê xwe çûne dibistanan. Şaxa Amedê ya Egitim-Senê ragihandiye ku di serdema qedexeya derketina derve de, li herêma ku pêvçûn lê qewimîne 15 dibistan û 7 hezar 450 xwendekar di bin tesîra vê pêvajoyê de mane(1). Hatiye bilêvkirin ku hin zarokên ku di pêvajoya pevçûnan de navber dane dibistanê paşê nekarîne tevî hemsalên xwe perwerdeya xwe bidomînin, vê rewşê jî bûye pirsgirêk ku zarok li dibistanên xwe bigurivin.

Malbatan îfade kirine ku di rewşa heyî de zarokên qîzîn perwerdeya xwe nedomandine û bûne alîkar bo karen nav malê, zarokên lawîn jî heke perwerdeya xwe domandibe piştî saetên dibistanê, heke dev ji dibistanê berdabe bi roj xebitîne û bo debara malê bûne alîkar.

Li Ameda ku rêjeya bêkariyê, îstihdama nefermî û karkeriya zarokan zêde ye, piştî ku zarokine dî yên Sûrê jî tevli jiyana xebatê bûn, pirsgirêkine nû li yên kevin ên xelkê Sûrê zêde bûn. A rast karkeriya zarokan bi tena serê xwe pirsgirêkeke girîng e lê di nav giloka mexdûriyeta makro de, ku ji aliye atmosfera pevçûnan ve hatî avakirin, bûye pirsgirêkek talî.


Ev agahî ji 498 kesên ku di nav 500 kesan de ne, hatî wergirtin; piştî pêvajoya pevçûnan 20 jê keçik, 23 jê kurik, tevde 43 zarokan dev ji dibistanên xwe berdane. 26ên van xwendekaran neçar mane ku dev ji dibistana navîn, 14ên van ji lîseyê û 3ên van jî dev ji dibistana seratayî berdin.

Li navçeya Sûrê rewşa perwerdeyê di serî de ji ber rewşa ekonomîk û pê re sedemine dî pir jî ne baş bû, ji ber pevçûnan rewş xirabtir bû û 43 zarok neçar hatine hiştin ku jiyanên xwe jê û pê de di bin siya van pevçûnan de biborînin.




Yên ku Piştî Pevçûnan Dev Ji Xwendinê Berdane	Zarokên Qîzîn	Mêr
	20	23

Temenê Yên ku Piştî Pevçûnan Dev Ji Xwendinê Berdane(Li Gorî Sala 2015an)



	Zarokên Qîzîn	Zarokên Lawîn
6-10 (Dibistana Seretayî)	2	1
11-14 (Dibistana Navîn)	13	13
15-18 (Lîse)	5	9

3.3. Tenduristî û Rewşa Psîko-Sosyal



	Nexweşînên Kronîk	Astengdar
Nexweşîn	302	177

Hatiye tespîtkirin ku di nav 500 malan de tevde 302 nexweşên kronik û 177 kesên astengdar hene. Hin serdêran diyar kirine ku di pêvajoya pevçûnan de ji neçarî tedawiya nexweşan nîvco hiştine, hinekan jî ji ber qedexeya derketina derve di peydekirina dermanan de zehmetî kişandine. Timikî hatiye bilêvkirin ku piştî pevçûnan bi taybetî pîran qeyrana dil derbas kirine û felç li wan ketiye û ji ber van sedemên navborî rêjeya mirina pîran zêde bûye.

Di çarçoveya xebatê de li malên ku serdanên hatî kirin piraniya serdêran jin bûne. Hemû jinên ku ligel wan têkilî hatiye danîn, diyar kirine ku rasterast an jî nerasterast di bin tesîra pevçûnan de mane. Li gorî qalkirina jinan di serdema pevçûnan de ji ber dengên pevçûnan ên zêde, ji ber rîska mirinê û di dema koça mecbûrî de ji ber astengiya gihaniya xizmetên tenduristiyê jin bi gelek pir-sgirêkan re rû bi rû mane. Hin ji wan ev in: neduristiya xewê, bêmehdî û pê re kêmkirina kîloyan, jiberçûn an jî xetereya wê, ji şîr ve buna jinên ku şîr didin zarokên xwe, mensturasyon(xwînîbûn). Hatiye diyarkirin ku ji aliye derûnî ve jî rewş û pirsgirêkên weke şaneyên xerabiya strese ya akût, depresyon, berteka zêde li hemberî hişyarkerek(dengê xaliyê, dengê ambûlansê, sîrena polîsan û hwd.), pirsgirêka kontrola hêrsê, xwe ji derve re girtin, tirsa mirin û dahatûyê, pêneewlehî hatine jiyîn.


Serdêrên jin bilêv kirine ku di pêvajoya pevçûnan de û piştî wê hin êşên fizîkî kişandine û di encama xizmeta tedawiyê de hatiye teşhîskirin ku vana ji ber xem, tirs û stresê(psîkosomatîk) ye. Ligel ku hema hema du sal di ser pevçûnan re derbas bûne jî hin rewşên ku weke xerabûna stresê ya piştî trawmayê tên îfadekirin, hatine dîtin. Hatiye tespîtkirin ku di jinan de rewşên weke xwe ji derve re girtin, pêneewlehî, tirsa dahatûyê dewam dikin.

Tesîra neyînî ya pevçûnan li ser tenduristiya fizîkî û derûnî ne tenê bo jinan derbasdar e. Wekî mînak; A.B.yê ku yek ji serdêrên mêr e, diyar kiriye ku ligel ku qedexe rabûye hêj nikare biçe Sûrê, ji ber giraniya derûnî ya wê pêvajoyê nexweşiyeke bi navê "Pemfigus"[12]lê peyde bûye ku ev nexweşî ji milyonê li 2-3 kesan peyde dibe.

Meriv dikare bibêje ku zarok li gorî mezinan bêhtir zehmetî dikşînin bo fêmkirina pêvajoyên weke şer, pevçûn, koç, tundiya nav malê ku rûtina jiyanê xera dikin; vêya di zarokan de dibe sedema nexweşiyên fizîkî û derûnî û risk heye ku van xerabûnan heya serdema balixî û xamatiyê dewam bikin. Bi taybetî di serdema qedexeya derketina derve de û di serdema ku pevçûn zêde bûbûn de; ji ber dengên pevçûnan, giraniya pevçûnan û koça mecbûrî gelek rewşên ku weke xerabûna stresê ya akût têne binavkirin, li zarokan peyde bûne. Hin ji wan ev in: pirsgirêka adaptasyonê bo ciheke nû, derneketina derve, nekarîna raketina bi tenê, nexweşiya xwarinê, bêmehdî û pê ve girêdayî kêmkirina kîloyan, bi xwe de mîztin, lalûteyî, lalîtî, pêneewlehî, meyla tundiyê, êrîşkarî, xwe ji der ve re girtin, hesasiya zêde bo dengan. Hatiye tespîtkirin ku yê hin zarokan rewşên wan ên weke bi xwe de mîztin, lalûteyî, lalîtî, pêneewlehî, meyla tundiyê, pirsgirêka adaptasyonê bo ciheke nû, derneketina derve, hesasiya zêde bo dengan berdewam in. Wekî din, hinek serdêran diyar kirine ku zarok li hemberî tişte, deng û axavtinên ku pêvajoya pevçûnan tînin bîra wan û li hemberî polîsan bertekên weke girîn, tirs, nerehetbûn, fikra ku dê heman tişt dîsa biqewimin, nîşan didin.

Bi neqilkirina malbatan ve girêdayî, hatiye tespîtkirin ku tevde di 60 zarokan de vê rewşê ji du salan zêdetir e dewam dike. Ligel ku di ser pevçûnan re du sal derbas bûne jî evan şaneyên ku weke xerabûna stresê ya piştî trawmayê tên binavkirin, dewam dikin, vê yeke xemder e. Malbatek bilêv kiriye ku di pêvajoya pevçûnan de qîza wan a 15 salî ya bi navê A.D. ji ber stresa zêde nexweş ketiye, nêzî sal û nîvekê di beşa nexweşên giran de razaye û piştre wefat kiriye. Malbateke dî jî îfade kiriye ku qîza wan a bi navê Z.K. ku di wextê pevçûnan de 12 salî bûye timî xwestiye li taxa wan a li Sûrê vegere, piştî bûyeran xwe ji derve re girtiye û ligel kesî têkilî daneniye, 4 meh berê li mala wan a ku niha lê ne ji balkonê ketiye û wefat kiriye, îhtîmal heye ku Z.K.yê ji ber rewşa xwe yî derûnî xwe kuştibe.

12) Nexweşîneke çerm e û giran e, bi piranî li ser çerm û di dev de, carna di hundirê poz de, di qirikê de, di çavan de û di organên zayendî de jî xuya dibe, wekî peqikên piştî şewatê dest pê dike, paşê ew peqik di demeke kurt de dipeqin û ser wan qalik digire, dibin weke birînên ne kûr. Naveke wê yî din di kurdî de yan di nav gel de tuneye. Pemfigus nexweşîneke kêmpeyde ye. Derheqê dîtina wê ya li Tirkiyeyê de daneyên teqez tunebin jî tê texmînkirin ku ji milyonek insanan bi 2-3 kesan re peyde dibe. Bi mêran û jinan re weke hev tê dîtin. Herî zêde bi kesên navsere re tê dîtin lê dibe ku di her temenî de jî bête dîtin. Hatiye tespîtkirin ku hin derman û kîmyewî di insanan de dibin sedema pemfigusê lê dîsa jî bi awayeke teqez nayê zanîn ku sedema wê çi ye. Çavkanî: http://turkdermatoloji.org.tr/icerik/detay/142



	Koç	Aboriyî	Derûnî	Fizîkî	Yên Din
Rewşa Tesîra Ji Ber Pevçûnan	500	485	475	17	2

Li gorî bersivên pirsên ku bala xwe dane çawaniya tesîra pevçûnan a li ser 500 malbatanên ku ligel wan rû bi rû hevdîtin pêk hatine; hemû malbat neçar mane ku koç bikin, %97ên wan ji aliye aborî ve, di nav %95ên wan de herî kêm kesek ji malbatê ji aliyê derûnî ve, di nav %3ên wan de jî herî kêm kesek ji malbatê ji aliyê fizîkî ve(derb, birîndarbûn û hwd.) tesîr jê girtiye.
Li gorî bersivên pirsên ku bala xwe dane çawaniya tesîra pevçûnan a li ser 500 malbatanên ku ligel wan rû bi rû hevdîtin pêk hatine; hemû malbat neçar mane ku koç bikin, %97ên wan ji aliye aborî ve, di nav %95ên wan de herî kêm kesek ji malbatê ji aliyê derûnî ve, di nav %3ên wan de jî herî kêm kesek ji malbatê ji aliyê fizîkî ve(derb, birîndarbûn û hwd.) tesîr jê girtiye.


3.4. Ziyana Madî û Tezmînat

Piraniya malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine; ji ber qedexeya derketina derve û tehdîda mirinê ya ji ber pevçûnan, ji neçarî malên xwe di destpêka pevçûnan de terk kirine. Lê malbatên ku nexwestine terka malên xwe bikin; ji ber nebûna ceyran û avê, ji ber kêmaniya xwarinê, ji ber zarok, pîr û nexweşan piştî wextekî ji neçarî terka malên xwe dane. Hemû malbatan îfade kirine ku fikra wan ew bûye ku dê qedexe kurt biajo û ew ê dîsa li malên xwe vegerin, rîska mirinê hebûye, ji ber wê gava terka malên xwe kirine bêyî ku alavên mala xwe û alavên xwe yên nirxdar hilgirin, derketine. Qismeke malbatên ku piştî pevçûnan bi komîsyona tespîta xisarê re çûne xaniyên xwe dîtine ku xaniyên wan û alavên wan xisar dîtine, hinekan jî dîtine ku xaniyên wan bi temamî xera bûne û li ser erdên vala tespîtên xisarê hatine kirin, komîsyon li gorî beyanan zabitname dinivîse. Malbatên ku xaniyên wan ji der ve xisareke cidî nedîtine jî îfade kirine ku alavên wan ên malê yên weke têkberên sipî bi derbên çekan xisar dîtine û ciyêz û doşekên hirî û alavên nirxdar ên weke zêr û ziber winda bûne.

Derketiye holê ku di nav malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine de, ji yên beyan kirine ku tezmînata alavan stendine, herî kêm 200 TL, herî zêde 11.000 TL stendine. Malbatên ku bilêv kirine ku

hemû danehevên wan alavên wan in, îfade kirine ku heqê alavan ên hatî dayîn ne miqabilî heqê rastîn ê alavên wan in, lê ji ber ku şertên îtîrazkirinê nizanin û nikarin rayedarek ku agahî bide peyde bikin, ji neçarî tezmînatê qebûl kirine. Lê hinek malbatan gotine ku piştî îtîrazkirinê meblaxa tezmînatê hatiye daxistin, ji ber vê ji neçarî vê meblaxê stendine. Hinek malbatan jî di hevdîtinan de diyar kirine ku ligel ku wexteke dirêj di ser qedexeyan re bihuriye jî hin malbatên ku pereyê alavan qebûl kirine hêj pereyên xwe nestendine.

Ji 500 malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine, 279an jê îfade kirine ku beriya pevçûnan li Sûrê di xaniyên xwe de bûne. Lê piştî pevçûnan hejmara malbatên ku di xaniyên xwe de ne, daketiye 74an. Ji ber rewşa pevçûnê ji 4 malbatên ku me ligel wan hevdîtin pêk anîne 3ê jê bêxanî mane. Pêkan e ku meriv sedemên paşxaneya vê rêjeyê bi vî awayî rave bike: gava meriv li rewşa tezmînê ya xaniyên xerabûyî yên li taxên Fatih Paşa, Dabanoglu, Savaş, Cemal Yilmaz û Hasirli ku li herêma qedexekirî û pevçûnan bû, dinêre meriv dibine ku li gorî ferqa senet û tapûyê kar û barên tezmînatê hatine birêvebirin. Hatiye hînkirin ku bo xwedî xaniyên bi senet derheqê xaniyên wan de ti agahî nehatiye dayîn, ên malbatên xwedî tapu jî sê şert dane wan. Li gorî ku malbatan diyar kirine ev şert tezmînata madî, xaniyek li TOKÎyê yan jî ji dêvla xaniyên wan ên li Sûrê dîsa xaniyek bûne. Lê malbatan gotine ku derheqê van sê şertan de paşê agahiyeke durist bidest nexistine, rewş hêj nediyar e. Di teklîfa ewil de tezmînata madî, li gorî nirxê rastîn gelekî kêm e. Di teklîfa duyem de tezmînata madî weke pêşînat tê qebûlkirin û xaniyek ji TOKÎ bo malbatan tê veqetandin lê divê malbat ser wê temam bikin. Vê yekê dê malbatan bixe bin deyneke giran. Di teklîfa sêyem de jî şûna xaniyên wan ên xerabûyî de li Sûrê bo wan xaniyek tê veqetandin, lê di vir de jî malbat nizanin bê xaniyên ku dê li Sûrê bêne avakirin kengî bêne temamkirin, çawa bêne avakirin û dê fîyetên wan çi bin. Malbatan bilêv kirine ku dê fiyetên van xaniyan ji yên TOKÎyê zêdetir bin, ji ber wê jî dê qet nikaribin ji bin wî barî derkevin. Piraniya malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatine, xwestine ku xaniyên wan bi fiyeteke guncan ji nû ve bêne avakirin û li Sûrê bijîn. Lê hema hema hemû malbat li ser ewê boçûnê bûne ku ev her sê teklîf jî vegera wan a li Sûrê zortir dike, dewlet naxwaze li Sûrê vegerin. Ji ber ku evê rewşê hê jî ne zelal e piraniya malbatên ku ligel wan hevdîtin pêk hatin, ligel ku beriya



	Xanî	Alav	Kargeh
Xweyîtiya Menqûl/Xeyrî Menqûlan	279	448	5
Rewşa Stendina Tezmînatê	34	271	2

pevçûnan li xaniyan xwe bûne, aniha li xaniyên xwe rûnanin. Weke dî, hin malbatan diyar kirine ku li herêma xerabûyî kargehên wan hebûne, ji ber ku qeydên wan ên fermî(lewhaya bacê, ruhsata kargehê) tunebûne nekarîne ti tezmînat bo wan bistînin.


Grafîka li jor rewşa xweyîtiya menqûl û xeyrî menqûlan a beriya serdema pevçûnan û tezmîna van nîşan dide. Ligel ku di nav 500 malbatan de 279 jê li Sûrê xweyî xanî bûne jî di dema hevdîtinên me de ji van malbatan 34an jê bi dewletê re li hev kirine, %88ên wan hêj bi dewletê re li hev nekirine. Hatiye tespîtkirin ku rêjeya lihevkirinê bo tezmîna alavan %60, rêjeya nelihevkirinê jî %40 e.

3.5. Destekên dema pevçûnê û yên piştî wê

%95ê nûnerên 500 malbatên ku li malên serdana wan hatî kirin, îfade kirine kudi dema pevçûnan de yan jî piştî wê yan wan bi xwe yan jî kesek ji malbatê alîkariya desteka insanî wergirtine, 25 nûnerên malbatan jî bilêv kirine ku heya îro ti destek wernegirtine.

Malbatên ku destekek wergirtine îfade kirine ku evan destekan ne bi tera xwe bûne, di wextê xwe de negiştiye ber destên wan û vê yekê barên wan girantir kiriye. Hatiye diyar kirin ku hin malbatan bo wexteke kurt alîkariya kire stendine, hinekan jî bi ti awayî vê alîkariyê nestendine. Malbatan îfade kirine ku jiyana li Sûrê him ji aliyê aborî ve, him ji aliyê civakî ve bo wan baştir bûye, diyar kirine ku ji ber ku wekî din ti dahateke wan tunebûye destek/alîkariyên hatî dayîn têrî wan nekirine. Hin malbatan jî bilêv kirine ku ti alîkarî bo wan ji vegera li Sûrê girîngtir nîne, hêvî dikin ku ji dêvla alîkariyê ve rê li ber vegera li xaniyên wan bête vekirin.

Hatiye dîtin ku ji xeynî destekên demkî yan jî bo carekî, destekên şaredariyan ên weke xurek, têkberên sipî û cil û berg birêkûpêk bûne. Alîkariyên birêkûpêk ên walîtî û qeymeqamtîyan, ku bi destê Weqfa Alîkarî û Hevgirtina Civakî(SYDV) dike, destekên weke xurek û kire bûne. Ji xeynî van cureyên alikariyên birêkûpêk hema hema ji sisêyan yeke malbatan bilêv kirine ku ji cîran û xizmên xwe destekê distînin, kêmasiya saziyên sivîl di encama lêkolînê de xuya kiriye.



4. SAZIYÊN KU MALBAT BER PÊ VE HATIN BERALÎKIRIN

Di pêngava duyem a vê xebatê de; xizmetên ku di pêvajoya koçkirinê de gihaye 500 malbatan, hatiye nirxandin û li gorî pêdiviyên heyî yên malbatan, piştî ku malbat hatine agahdarkirin bo sazî û dezgeyên fermî û sivîl ên li navenda bajarê Amedê hatine beralîkirin. Beralîkirin li gorî xwestekên malbatan; an rasterast pêk hatine yan jî li ser navên wan randevu hatine stendin. Di vê çarçoveyê de malbat bo saziyên ku li jêr hatine rêzkirin, hatine beralîkirin.

Baroya Amedê

98ê malbatan ên ku ligel wan rû bi rû pêk hatine, piştî ku hatine agahdarkirin bo Baroya Amedê hatine beralîkirin. Malbatan xwestine ku derheqê xaniyên xwe yên xerabûyî de agahî wergirin û heke hewce be dewa vekin û li ser tezmînata eşyayên xwe yên ku ji ber xerabûna xaniyan xisar dîtî agahî wergirin. Evan beralîkirinan bi piranî ji ber van pêk hatine.Hin ji van malbatan jî wekî din xwestine ku bikevin dû "heqê perwerdeyê" yê zarokên xwe ku di pêvajoya pevçûnan de ji neçarî dev ji perwerdeya xwe berdane, bikevin dû heqê xwe yê tenduristiyê ku di qedexeyên derketina derve de nekarîne xwe bigihînin wê xizmetê û hin pirsgirêkên xwe yên şexsî çareser bikin. Ji ber van jî hin malbat bo baroyê hatine beralîkirin.

Nûneriya Amedê ya Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê

Di çarçoveya xebatê de ligel kes/malbatan hevdîtin pêk hatin, ji nav vana 41 kesên ku trawmayên wan ên ji ber pevçûnan dewam dikin bo Nûneriya Amedê ya Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê(TÎHV) hatine beralîkirin. Hatiye dîtin ku li gorî daneyên meha sibatê tedawiya 7 kesên ji van dewam dike.

Weqfa Alîkarî û Hevgirtinê ya Civakî(SYDV)

Hatiye raçavkirin ku piraniya malbatên ku di çarçoveya xebatê de ligel wan hevdîtin pêk hatine, xwedî "karta kesk" in û hay ji destekên Weqfa Alîkarî û Hevgirtinê ya Civakî yên weke "meaşê astengdaran û pîran û pereyê xwedîkirinê" hene. Piştî hevdîtinan hatiye tespîtkirin ku pêdiviya 29 kes/malbatan bi van alîkariyan heye; 7ên ji van bo xizmetên xwedîkirina astengdar û pîran, 3yên ji van bo alîkariya dê û zarokan, 2yên van bo meaşê pîrîtiyê, 5ên van bo stendina rapora tenduristiyê, 10ên van bo alîkariya xurekan, 2ên van jî bo alîkariya sotemeniyê hatine beralîkirin.

Serokatiya Daîreya Xizmetên Civakî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê

